

## Li dijî şerê ku ew dimeşînin, aşitiyê rêxistin bikin !

### Bang jibo çalakiya hemberi Zirweya G20 2017 li Hamburge

#### G20 – Normal kirina rewşa awarte

Dema li hamburgê di 7. û 8ê tîrmehê de dûbare desthilatdarên cîhanê ên xwe binavkirî werin li gel hev, ewê vê carê jî ji bo dewrûber û mirovahiye encamên nebaş dekevin holê. Kaosa pergala kapîtalîst pir kûr e. Bi rêbazên pir dijwar dixwazin hêza xwe serwer bihêlin. Ji ber vê sedemê amûrên leşker und polîsan berfirehtir dikin. Lewra şer meşandin û ji bo wê sîleh firotin hîn jî bazirganiyeke serkeftî ye. Ji bo hêza xwe bi ewle bikin, desthilatdar bêhtir xwe dispêrin bindest û disiplîn kirina civakê. Minakên niha di rojevê de em li Emerikayê bi Serokwezîrê ku hatiye hilbijartin Trump, li Tirkiyê bi Erdogan, ê ku bi rêbazên faşîzane şer li dijî gelên berxwedêr ê di welatê xwe de dimeşîne, qismên Bakurê Surî dagir dike, an jî bakurê iraqê/başûrê Kurdistanê êrişên hewayî li dijî gelên sîvîl dike ye.

Dema li Hamburgê hevdîtina G20 were lidarxistin, ê salek tije bibe ku endamê NATO-turkiyê di nava rewşa awarte de be. Ev tê wateya: Bi girtinan bêdengkirin hêzên dijber-opozîsyon, îşkence û gef xwarin, wendakirina mafên mirovan, rakirina dabeşkirina hêzê, gur kirina netewperestî, mîltarîzm û nijadperestî her wiha zêdebûna êrişên zayendperestî û bavîksalari.

Dewletên kapîtalîst ên rojavayê cîhanê, ên ku xwe wek berdevkê mafên mirovan dibînin, bi rejîma AKP ê re hevalbendiyê dikin. Bi pêkanîna pergala wezîrtî dixwestin diktatoriya yek zîlam a heyî bi Erdoganre eşkere meşrû bikin.

Merkel jî berya Referendumê, wek berya Hilbijartinên Parlamentoyê di 2015 de, serlêdana Erdogan kir ji bo nîşaneyê hevkarîyê di navbera dewleta alman û turkiyê de û her wisa vekirî piştigiriyê dide Referendumê, dide Erdogan.

Cihê hevdîtina G20 ne tesadûf li Hamburgê ye. Dewleta alman yek ji hêza navendî ye, di pêşketina politîka ya ewropa û navnetewî de. Yekîneyên alman cihê xwe di şerên cihanî de digrin. Ev di xalên cûr bi cûr de xwe destnîşan dike. Her wisa çapgeha federal nasnameyan ji bo hezaran koçberan çê dike, daku çavdêrî

û zordariyê pêk bîne. Ev fermana berhevkerinê ya almanya dewletên mîna yunanîstanê hildiweşîne û bi xwe ve girêdide. An jî firmeyên çekdarî mîna Heckler & Koch, Krauss-Maffei Wegmann an jî Rheinmetall sîlehan dişînin her deverên cîhanê û cihên hilberînê li dewletê ku lê şer heye avadikin.

Di heman demê de zîrweya li Hamburgê, zîrweya yekemîne ku piştî Genua dîsa li bajarekî mezin ê ewropa tê lidarxistin. Di nerazîbûnên li Gûnea 2001 de Carlo Giuliani yê 23 salî jî aliyê polîsekî

ve hate qetilkirin. Mîntîqa Hamburgê jî du hêlan ve nîşaneyê siyasiyê. Ji aliyekî ve dewleta alman sekna xwe wek hêza rêvebir îdia û dijdîne, ji aliyê din ve dixwazin bicerbînin desthilatdar dikarin heya kîjan astê biçin û berxwedana li hember di kîjan astê de ye, ya ku li dijî wan pêş dikeve.

Li dijî bindestiya wê û li dijî hegemoniya modernîtîya kapîtalîst bi tenê bersîvek dikare hebe: xwe birêxistin û her roj berxwedan li dijî pergala heyî were meşandin. Li dijberî pergala ku xwe li ser hîmê bavîksalari, dewlet, îxtîdar û zordari yê ava dike em bi fikrê azadiya zayendî, xwerêveberin û avakirina jiyanek azad pêşwazî dikin ango bi konfederalîzma demokratîk. Bê dewlet û îxtîdarê jiyanek din û cûda ji bo her kesî pêkane. Avakirina civakek demokratîk, ekolojîk û azadiya zayendî li Rojava hatiye destpêkirin.

Parastin û berfirehkirina berxwedanê û avakirina nûjen erkên me ne.

Dema ê wek Trump, Erdogan, Merkel û her navên wan çî bin werin Hamburgê, emê destnîşan bidin, helwesta me ji bo wan çî ye û têgihiştina me ji bo jiyanê çî ye.

NAV-DEM – Democratic Social Center for Kurds in Germany | Ceni – Kurdisches Women's Office for Peace | TJK-E | JYK/YXK – Kurdish Student's Association | ISKU – Information Office Kurdistan | Kampagne TATORT Kurdistan | Ciwanên Azad | Jinen Ciwan ên Azad